Çavên te birijin ey bêxwedîtî!

Ev wêne ji hêla xwendekarekî min ê kevin ve ji min re hatin şandin. Gelek mirovên me ji xwe re kirine kar, li çiya û banî û zozanên Kurdistanê li pey zêran digerin... Kîjan kevir û zinar, ên "xwedî taybetmendiyên xwezayî û dîrokî" li ber wan dikevin qet qetî, parçe parçeyî dikin.

Destê wan digihîje kîjan diwarên xirbeyan, wek xiltên kor heta binê hîman(temel) dikolin, hilwedişînin, serobino dikin...

Tu dibê qey bûne Cengîz û Tîmûr û bi welatê xwe ketine; kevir li ser kevir nahêlin; dirûxînin, wêran û wêrtas dikin...

Ji bo xatirê Xwedê bifikirin, çavên xwe li seranserî Cihanê bigerînin hûn welatek evqas bê xwedî û stûxar dibînin ku dewleta- xwedê giravî - li serî alîkî ve, gelê xwediyê wî- dîsa Xedê giravî- alîkî ve bibin yek û bermahiyên wî yên herî giranbiha yên ji bav û kalan yadîgar bi bendavan ew jî nebû bi bêr û tevir û geran û loman ji holê rakin?

Erdnîgariyek evqas bêsiûd û bê êxbal heye ku dîroka wê, şopên şaristaniyên wê bi destê ewladên wê bên paxişkirin û şûştin! Ev çi xezeb û bobelat e ser me de hatiye?

Ew her dû çivîkên li jor êdî tunene!

Ew zinarê li jor; ew warê ku herdû çivîkên reben ji bextê xwe re bi hezar salan e li ser koça xwe danîne, bi destê nezaniyê, bi destê çavbirçîbûnê, nan na wele bi destê talankeriyê hatiye hûr hûr kirin, parçekirin, ji holê rakirin... Ji binî jî-rast derew- ew her dû hêk derketine û- di ber wan de bimîne, ji zikê wan dernekeve- bûne para devê wan rawilan...

Di nav şert û mercên şer de xwediyên vî welatî, yên ji dil û can, firsenda xwe nedîtin ku bi têra dilê xwe li axa xwe xwedîtî bikin, bermahiyên dîrokiyên wê, berhemên devkî û nivîskiyên wê, dar û berên wê, teyr û tirûlên wê biparêzin û bêkêmasî ragihînin nifşên pêşerojê. Lê piştî aşitiyek bi rûmet divê em bi tevahî mil û zendên xwe badin û welatê xwe yê bi destê neyar û nezanan wêran û wêrtaskirî şên û aram kin.

Têbinî:Ez rondikên çavan didim alîkî û ji hevalên dîroknas û arkeologan dipirsim; gelo ev bermahiyên kîjan gelî, kîjan serdemê ne?

Ew çivîk ne teyrên tawus ên Êzidiyên me bin?

Bi qasî ku ez dizanim di mîtolojiya Mezopotamyayê de teyr xwedî taybetmendiyeke pir mezin e. Ger we tu tiştek jê dernexistibe, ji kerema xwe re ev wêneyan rabighînin hin kesên pîspor; ka ew çi dibêjin?

Bi ya min hêk ji binê wî kevirî derneketine; jiber ku ew dirufîn objeyên nû yên li atolyeyên kevirê seqî yên îro(atolyeyên mermeran) tên çêkirin.

Mamoste Marûf
mamostemaruf@yahoo.fr